

**Partiya me şanaziyê bi vê derbazbûyiya pirr ji hemase û berengarî û bi wan xwînên rengîn ve dike ku li pêxema bidestvehatina armancên xelkê Kurdistanê de rijiya ye ser xaka pîroz a Kurdistanê û deşt û dolên welat rengîn kirine...**

Tahir Mehmûdî

•••» 3

Bidestveanîna mafên neteweî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# AGIRÎ

**Biryarnameyek giring**

**biryarnameya çavdêrî bi ser bazirganiya çek û teqemeniyan di civêna kora giştî a NY de hat pejirand, û Piraniya welatên weke Amerîka, Berîtaniya, Çîn û Firansayê ku çek û teqemeniyan dişînin welatên din, bi dengê xwe ê erênî, piştewanî ji biryarnameya han kirin. hêjayî basê ye ku Îran û Koreya bakûr û Sûriyê dijî vê biryarnameyê ne.**

Duheftînameyek Siayasî-GiŞtî Ye, PDK Îranê diweŞîne www.kurdistanmedia.com/kurdî www.agirimedia.org Hejmar (203) 04-04-2013 Buha (150) Tûmen

## Xobî Emînî



Newrozê tirs xiste nav dilê dîktatoran

•••» 4


## Riza Fethullanijad



Bazar germî bo hilbijartinê

•••» 5


## Selîm Zencîrî



Ew bav mir!

•••» 7

## Eskender Ceferî



Ka keziyên rewşen ka biskên dirêj

•••» 9

## Şehab Xalidî



Cudahiya di navbera du peyamên newrozî de

•••» 10

# Şehîdên Kurdistanê rûmeta me ne




**Rêûresma 10'ê Xakelêweyê li binkeya Deftera Siyasîa PDKÎ de birêve çû.**

sibêdeya roja 30'ê Adar a 2013'an, rê û resm bi amadebûna sekreterê giştiyê yê PDK Îranê, endamên reberî, malbat û pêşmergên PDK Îranê , bi serdana goristana şehîdan dest pêkir. Beşa yekem a rê û resmê bi rêjeya Eskerî li fêrgehê heya ser gorstana şehîdan dest pêkir û piştre rêzdar "Mistefa Hicrî" li gel Xedîce Lahîcanî kiça şehîd "Mela Ebdullrehman Lahîcanî" û xûşka şehîd "Mirad Lahîcanî", gul li ser gora şehîd "Seyîd Selam Ezîzî" danîn.

Piştere pêşangaha nîgarên şehîdên PDK Îranê ji aliyê sekreterê giştî yê PDK Îranê û "Xatûn Ruqeye Semedî" xêzana "Şehîd Xale Şêx Mihemed Bilabasî" û dayîka "Şehîd Yûnis Bilbasî"ve ji bo beşdarbûyan hat vekirin.

Li beşa duyem a rê û resmê de ku li hola merasimên PDK Îranê de birêve çû, Li destpêkê de sirûda neteweî a "Ey Reqîb" hate xwandin û piştre çend xulek bêdengî borêzgirtina ji canê paqij ên şehîdê Kurdistanê hat ragehandin. Paşan peyama komîsiyona Komelayetî ji aliyê rêzdar "Tahirî Mehmûdî" Endamê Komîteya Nawendî a PDK Îranê hat pêşkeş kirin.

Naweroka vê rêûresmê sirûdên taybet bi roja şehîdan, û herweha xwendina peyama hevbeş a rêxistinên Ciwanan, Jinan û Xwedekarên Demokrat ên Kurdistana Îranê ji aliyê dirêz "Xalib Hebîbî" endamê heyeta birêveberiya yekîtiya Xwendekaran ve bû.

www.arsivakurd.org

# Sê dehik û rapirsiyek

Şehab Xalidî

sergotar

Ew referandoma ku li 10'ê Xakelêweya sala 1358'an (Adara 1979'an) bo diyarîkirina sîstema hikumetî piştî hiloşîna rejîma paşatiyê birêve çû, herçend bi berçav wek hilbijartuneke demokratîk xuya dikir,, lê li pişt vê pêngava bi berçav demokratîk şêweya herî xirap ya zewtkirina heqê hilbijartinê hatibû veşartin. Jiber ku, xelk hatibû serpişkkirin ku tenê di anvbera sîstema "Paşatî" û " Komara îslamî" de yek ji wan hilbijêrin.

Xelkê Îranê ku rejîma paşatiyê nasîbûn,û gelek êş û azar ji dest vê rejîma paşatiyê dîtibûn, diyar bû ku amade nabin ku dengê xwe bidin sîstema paşatiyê. Lewra xelkê Kurdistanê wê demê bi nîşaneya nerizayetînîşandan li hember demokratîknebûna refrandomê ew raferandom baykot kirin.

Encama vê rapirsiyê jî, her berahiyê de, rohn û eşkere bû. Jiber ku Xomênî her zû ragehandibû ku yên deng nedin sîstema "Komara Îslamî", tê vê wateyê ku ew Îslamê naxwazin. Li encam de li roja 12 xaklêweya 1358 de hate raghandin ku komara Îslamî bi pairaniya nêzîk bi tewaya dengean hatiye hibijartin.

Piştî referandoma sala 1358'an heya niha rejîma Komara Îslamiya Îranê tu referandomek din birêve nebiriye. Jiber ku li heyamê zêdetir ji sê dehikan deshilatdariyan wan de çendîn bi nav hilbijartin li vî welatî de birêve çûne, û li qonaxên curbicur, bi taybetî piştî hilbijartinên serkomariyê, û derxistina navê Ehmedînijad ji sindûqên dengdanê wek serkevtiyê di rikeberiya hilbijartinê de, ku bû sedema rabûna xelkê û destpêkirina çendîn meşên nerazîbûnê ên berfireh ku di rastî de pêpkên rejîmê lerizandin, êdî ji wan re îsbat bûye ku êdî tu pêgeheke wan, di nav xelkê de nemaye, û her referandomek dikare bê wateya bidawîhatina sîstema deshilatdariya wan û rûxana koşka dîktatoriya wan, ya ku li ser xwîna xelkê bêçare ê welat û li ser dexelkarî û riyakariyê hatiye avakirin.

# Rêzdar Mistefa Hicrî Sekreterê Giştî Ê Pdkî Bi malbatên şehîdan re civiya




Rêûresma 10'ê Xakelêweyê li binkeya Deftera Siyasîa PDKÎ de birêve çû.

Kurdistanmedia: Sekreterê giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li binka Deftera Siyasî bi malbatên serbilind yên şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê re civînekpêk anî.

Di vê civînê de birêz Mistefa Hicrî got: "Gelek caran hikumet û dijminên me ji me bihêztir bûne û gelê Kurd li Rojhelata Navîn de li hemberî van dijminan sekinîne, û lehengiya xwe nîşan dene.

Rêzdar Mistefa Hicrî li dirêjahiya axavtina xwe de eva jî anî ber bas û got: "Li gorî ev rewşa ku Kurdistana Turkiyê û Sûriyê têde ye, çavnihêriya vê tê kirin ku ev jî weku Herêma Kurdistanê bi mafên xwe şad bin".

Sekerterê giştî yê PDK Îranê amaje bi rewşa Kurdistana Îranê jî kir û got: "Li Kurdistna Îranê rejîm bi hemû hêz û şiyana xwe li hewla serkûtkirina hevwelatiyan de ye, lê hesta neteweyî di vê beşa Kurdistanê de jî zor bihêz e, û roj bi roj bihêztir dibe, û keç û xortên me heta li girtîgehên rejîm de şehîd bûn, lê qet amade nebûne serê xwe bo rejîm xwarkin".

## Daxwaza 200 zindaniyên Kurd ji berpirsiyarên hikumeta herêma Kurdistanê

Li gor nûçegehaniya Ajansa Kurdpa: Nêzîkî 200 kes ji hevwelatiyên Kurd ên herêma Kurdistanê li zîndana "Recayî şehra Kerecê" hatîne destbiserkirinû malbatê wan jî tu zanyariyek ji çarenivîsa wan nînin.

Li gor zanyariyên ku li ser zîndana Recayî şehr ya Kerecê bilav bûne, wan zîndaniyan daxwaz ji berpirsên herêma Kurdistanê kirine ku bilez alîkariyê bidin wan.

## Dewleta Turkiyê dengê neteweyên yekbûyî bilind kir

Berdevkê komîsaryaya bilind a Rêkxirawa NY bi sedema derkirina 600 penaberên Sûriyê rexneyek tund li dewleta Turkiyê girt.

"Fîlîmîng" ev kiryara Turkiyê bi dijî yasaya navnetewî û mafên mirovan da zanîn.

Ji aliyek din ve rêkxirawa Lêborîna Navnetewî, derkirina van 600 penaberên Sûriyê ji aliyê Turkiyê ve wek giringînedana dewleta Turkiyê bi mafên penaberan dazanîn.

Turkiyê piştî pevçûna polîsên Turkiyê û penaberên kempa "Şanlî Orfa", 600 penaberên vê kempê derkirin.

www.arsivakurdi.org

# Deqê peyama birêz Tahir Mehmûdî berpirsê komîsyona komelayetî a PDKÎ bi boneya roja şehîdên Kurdistanê



Xelkê xebatkar ê Kurdistanê!
Malbatên serbilinde şehîdan!
Endamên birz ên rêberî û kadr û pêşmergeyên hêja!
Mêhvanên birêz!
Em ji dil û can xêrhatina we dikin, bo rêûresma 66'emîn salvegera bidarvekirina Pêşewa QazîMihemedê nemir û hevalên wî Seyfî Qazî û Sedrî Qazî ku li Çarçiraya Mehabadê bi destê celadên rejîma paşatiyê hatin bidarvekirin, ku piştre roja 10'ê Xakelêwe wek roja Şehîdên Kurdistanê hate binav kirin. Ew yek jî bi sedema meznahiya vê qurbaniyê ye ku li vê rojê de pêşkeşî baregfeha azadiyê hatiye kirin. Cuda ji vê jî em dixwazin vê rojê bikne derfetek bo yad û bîranîna Komara saw a Kurdistanê, ku pêşewa wek yekemîn serkomarê modern ê Komara Kurdistanê, çawan bi şanazî ve li hemberî cînayetkarên deshilatdar de sekinî, û bi xweragirî ve çû bin darê îdamê.
Qazî Mihemed heke ketiba pey jiyana taybetî a xwe, û amade ba ku sitûyê xwe li hemberî daxwaziyên rejîma paşatiyê de bitevîne, gellek bi hêsanî dikarî ji miirnê rizgar be. Lê wî hiozra jiyanek meztir ji berjewendiya neteweya xwe dikir, û lewra jî riya mirinê bi şanazî ve li pêxema serbilindiya neteweya xwe de hilbijart. Pêşewa em hîn kirin ku mirovên şoreşgêr li her pile û payeyek civakî û siyasî de be, û her nav û navdariyek hebe, wê demê şoreşgertiya xwe îsbat dike ku gellek pêdagirane li pêxema armancên gelê xwe de tekoşînê bike, û di vê riyê de ji mirinê jî netirse.
Rast e ku Pêşewa hate şehîdkirin, lê şehîdbûneke ew qas ciyê şanazî ve hilbijart ku bo heta heta navê wî bibe remza xebat û serînetevandinê. Lewra jî li dîroka xebata gelê me de, wek serkarwanê şehîdan hatiye naskirin û roja şehîdbûna wî jî kirine roja şehîdên Kurdistanê.
Hevalên hêja! Piştî şehîdbûna Pêşewa Qazî Mihemd de, bi hezaran kesî ji têkoşerên partiya Qazî, bi şanazî ve li pêxema man û hebûna gelê xwe de canê xwe gorî kirin û emegdariya xwe bi rê û şopa şehîdan selimandin. Li nav şehîdên partiya me de, ji jinên xebatkar, ciwanên têkoşer, xwendekar, mamosta bi giştî û mamostayên zankoyê bi taybetî, û xelkê gund û bajar û mamostayên ayînî, û zarokên hejar û dewlemend û bi kurtî tewaya tex û qatên civaka kurdewarî xûya dikin, û bi dehan takên pispor li warên curbicur ên zanistî ku li serveyî hemiyan Pêşewa Qazî Mihemed û Dr. Qasimlo û fDr. Şerefkendî dixûyin.
Giringiya xebata gelê Kurd tenê li wir de nine ku bi sedan salî dom hebûye û serkevtin û têkşikanek zor bi xwe ve dîtiye, belkû mgiringî û pîroziya wê pitir li wir de ye, ku xortên wî gelî li her rewşekê de bi bûna her deshilatek nawendî, alaya pîroz ya xebat serînetevandinê bilind ragirtine.
Gelê Kurd ne kêfxweş e ku gellek şehîdên zaf hene, ne jî şehîdbûnê wek armanc dibîne, gelê me qet nexwastiye û naxwaze ku bo gihîştina bi hêvî û armancên xwe dilopek xwînê ji leşê xortek wê birêje ser erdê. Lê bi baldan bi vê rastiyê ku dujminên gelê me zalim û zordar û xwînrêj in, bersiva her daxwazek rewa û mirovî bi agir didin, û gelê Kurd jî bi neçarî bo parêzgarî ji man û hebûna xwe ji her cure berengarbûnek rewa mifah wergirtiye.
Lewra bi xatircemî ve em dikarin bêjin ku şehîdên riya rizgariya gelê me çi ên ku li qada şer û berbirûbûna di gel hêzên dujmin de şehîd bûn, û çi yên ku hatine bidarvekirin yan li her riyeke xizmetkirina bi gel û neteweya xwe canê xwe gorî kirne, li her pile û berpirsayetiyekê de bibib, û bi her navekêve bo azadiya gelê xwe xebat kiribin, her hemû jî li refa nemirên dîroka Kurdistanê de ne, û nav û yad û bîreweriyên wan li dilê her kurdek welatperwer de tê bicih kirin. Çavkaniya vê hesta şoreşgêrane jî ku ew kêşana nav qada xebatê û ew han dane ku ew bo azadiya gel bimrin tu car tarî nabin.
Malbatên serbilinde şehîdan!
Dîroka xebat û tekoşîna dûr û dirêj ya PDKÎ tijî ye ji evraz û nişîv û astengî, tevaya rûpelên vê dîroka pirr ji serfirazî bi xwîna komek ji baştirîn û bi emegtirîn xortên partî û gelê me hatine nivîsandin. Partiya me şanaziyê bi vê derbazbûyiya pirr ji hemase û berengarî û bi wan xwînên rengîn ve dike ku li pêxema bidestvehatina armancên xelkê Kurdistanê de rijiya ye ser xaka pîroz a Kurdistanê û deşt û dolên welat rengîn kirine.
Lewra axavtina partiya me li hember şehîdan û malbatên serbilinde wan, hertim û bi taybetî li rojeke wek îro de ew e, ku bi girtine pêşa rêbaza şehîdan maf û azadiyê bi dest bixin, û armancên gel bi destve tên, yanjî di vê riyê de em jî serê xwe dadinên. Li 10'ê Xakelêweya 1326'ê Rojî de rejîma paşatiyê karî ku darek gellek bilind û mezin bibirre, lê bê xeber ji vê ku reh û rîşeya vê darê li bîr û hişê her kurdeke welatperwer de şîn bûye, û bi vê sanahiyê nayê binbirr kirin.
PDKÎ bi jixweborîn û cangorîtiya malbatên şehîdan şanaziyê dike, û li vê derfetê de silavan ji wan re dişîne. malbatên şehîdan kesên herî ezîz ên xwe di riya azadî û bexteweriya gelê xwe de kine qurbanî. Gellek caran hebûye ku malbata şehîdekê piştî şehîdbûna xortek xwe , xorteke din şandiye qada xebat û berberekaniyê û nehêlaye ku çepera xortê lehenge wan vala bimîne.
Neteweyek ku xwediyê vê morala bihêz ya şoreşgerî be, bi xatircemî ve serdikeve, û li encam de digîje hêviyên xwe, lewra em xatircem in ku dujminên maf û azadiyê şikestê dixon û li encam de li hemberî îradeya bihêz ya xelkê Kurdistanê de teslîm dibin. Lewra PDKÎ îro ji her demeke din zêdetir bi serkevtina xebata xelkê Kurdistanê xweşbîn e, û bi geşbînî ve piştî kongireya xwe ya 15'ê di rêbaza xebatê de bi îradeyek qahîm ve pêngavan hildigre.



Dom R: 4'ê

**Doma: R 3'ê**

**Xelkê tekoşer ê Kurdistanê!**

Erkê we li hember şehîdan bi tenê ew nine ku hûn wan bibîr bînin, li roja 10'ê Xakelêwê de herne ser gorên şehîdan û rondikan bo gula perperbûyî ya temenê wan birjînin û kincê xem û taziyê lixwe bikin.

Bo neteweyek zindî ê di halê şoreşê de riya herî baş bo rêzgirtina ji şehîdan ew e ku hewil bihê dan, ku xebat bo gihîştina bi hêviyên şehîdan berdewam be. Bê nîşandan ku ew armanca pîroz ya ku bi dehan hezar kesî xwîn jêre daye û canê xwe di pêxemê de fîda kirine, herweha bilind dimîne.

Xelkê Kurdistanê li pêwendiya bi şehîdan re erkek din jî li ser milê wan e ku tu carî nabe ji wan bixafilin, ew erk jî pêk tê ji xizmetkirin û rêzgirtina ji malbatên wan şehîdên serbilind.

Renge kesek yan malbatek ku derdê dûriya yek ji hezkiriyên xwe tam nekiribe, nezane ku giribgiya vê pêregihîştin û çavdêrîkirinê ta çi qasekî ye. Ya rastî ew e ku hevderdî nîşandana xelkê li gel malbatên şehîdan û beşdarîkirna li xem û azarên wan de bi her radeyekê ku îmkan hebe, dikare bandora xwe li ser hest û soza wan malbatan hebe. Vê demê ye ku ew hest bi vê yekê dikin ku heke xortên wan li riya armancên xelkê Kurdistanê de canê xwe bexşîne, û li riya azadî û xweşbextiya gelê xwe de serê xwe danîne, xelk jî emegdar in û li vê riyê de, wê xelata cangorîtiyên wan bidin. Bo birêvebirina erkek weha giirng û şoreşgerane û nîşandana vê hesta pak derheq malbatên şehîdan, tenê roja 10'ê Xakelêwe bes nine. Belkû hemû rojên salê û hemû salên temen, roj û dema bicihanîna vî erkî ne.

Li roja 10'ê Xakelêweyê de PDKÎ silav û rêz û emegdariya xwe ji malbatên şehîdên Kurdistanê re dişîne, herweha silavan ji canê pak ê şehîdên sorxelat ê gelê me re dişîne ku canê pak ê xwe di riya bidestvehatina armanca rizgariya neteweya me de bexşîne û bûne sembola fîdakarî û cangorîtiyê.

Em hêvîdar in ku gellek nekêşe ku em rêvîngên azadiya Kurdisstanê pêkve li ser gora şehîdan û li ser gora Pêşewa Qazî Mihmed, cejna azadiya neteweya xwe bigrin.

Bi hêviya vê rojê
PDKÎ
Komîsyona Komelayetî
10.01.1392



# Newrozê tirs xiste nav dilê dîktatoran

Xobî Emînî

Newroza îsal bi guhertin û bûyerên ku li herêma Rojhilata Navîn diqewimin û hemû parçeyên Kurdistanê jî di nav de, mizgîniya biharek xweş û ronî dide netewa kurd. Me dît ku li Bakûrê Kurdistanê dengê aştî û azadiyê li Newroza Amedê bilind bû û Newroz û sersal bi peyama aştiyane û hewildan bona çareseriya demokratîk a birêz Ocalan roniyek taybet xist nav dilê hemû aştîxwazên cîhanê û Kurdistaniyan bi taybet.




Ji aliyekî din li Rojhilatê Kurdistanê, ligel ku ev 34 sal in siyaseteke tund a qirkirinê û pêkanîna xof û tirsê di nav gelê kurd de ji aliyê karbidestên Komara Îslamî ya Îranê ve tê meşandin, da ku gelê azadîxwaz û demokrasîxwaz ê kurd ji maf û xwestekên rewa û demokratîk ên xwe paşde bide, lê heta niha siyaseta çavtirsandina xelkê bi kuştin, girtin, geflêxwarin û tundiyê bi awayekê bersiv dabû. Lê germ rêveçûna şahiyên Newroza îsal li pirraniya bajarên Rojhiatê Kurdistanê, nîşana rabûn û hişyariyeke neteweyî û mafxwazane yeku zêdeyî 30 salan e hatiye fetisandin. Desthilatdarên rejîma tarîperest a Komara Îslamî heta bi Newroz û dîlana kurdî jî hessas in û şabûn û govenda hevwelatiyan weke tirs û xof dibînin bo ser desthilata xwe ya lerzok û sist. Newroz di nav çand û jiyana civakî a gelê me, sembola yekgirtin û tebahî û azadiyê ye. Loma me dît, ji bona ku şahiyên Newrozê li gund û bajarên Rojhilatê Kurdistanê bi girseyî neyên pîrozkirin, hêzên tarîperest ên Komara Îslamî li Kurdistanê tedbîrên xurt ên leşkerî û ewlekariyê girtin pêşiya xwe. Lê îsal ji hemû salên berê baştir Newroz li gund û bajarên Rojhilatê Kurdistanê hat pîrozkirin.

Sedem jî ev e ku stratejiya çavtirsandina xelkê kurd li Kurdistan êdî bê bandor maye û pirraniya xelkê bi awayên sivîl nerazîbûna xwe li hemberî siyasetên serkut û qirkirin û xof û wehşet pêkanîn di nav civakê de şermezar dikin. Şahiyên Newroza îsal li Rojhilatê Kurdistanê xof xistiye nav dilê karbidestên Komara Îslamî û rojev wisa dide xuyakirin ku salên pêşiya me azadiya gelê kurd misoger dibe û dawiya desthilata rejîma Xomeynî weke dîktatorên din ên herêmê dibe.

Peyamek din a Newroza îsal li Rojhilatê Kurdistanê ev bû ku herçiqas veşartî yan nîv veşartî jî be, lê rabûnek derketiye holê û êdî gelê kurd li Îranê ji nasnameya xwe xwedî derdikeve û teslîmî siyaseta çavtirsandina Komara Îslamî nabe ku ev 30 sal zêdetir e li dijî gelê kurd dimeşîne.

## Ava gola Urmiyê zêde bûye

**Çavdêrên nawenda lêkolîna avê li parêzgeha Urmiyê ragehandin ku, ava Gola Urmiyê zêde bûye.**

Mêhreng Dustî Rizayî ragehand ku bi sedema barîna Befr û Barînên zaf di sala 1391 û 1392'an de, nêzîk bi 200 milyon mêtira çargoşe av rêjiyaye nava gola Urmiyê de, û ev yek bûye sebebê zêdebûna 40 santîmetr ji ava gola Urmiyê.



www.nerganavaklarii.org

## Rûpelek din ji cînayetên rejîma Îranê

Roja 5’ê Xakelêweya 1362’an (1983’an), 21 kes ji xelkê bê berevan ên Xelîfelyan û Çeqel Mistef û Gorrxane ser bi bajarê Nexedê bi destê Celadên rejîma Îranê şehîd ketin.

Herweha roja piştre wate roja 6’ê Xakelêweyê rejîmê êrîşî ser gundê Qelatan ser bi bajarê Nexedê kir.

Roja 8’ê Xakelêweyê jî hêzeke yekcar zêde ji pasdar û kirêgirtiyên êrîşî ser gundên Kanîreş û Pîrancixê li Urmiyê kiirn, lê di gel berxwedaniya pêşmergeyên PDKÎ ên hêza sergord Ebasî û hêza şehîd serwan Hatem û hêza Bergirî berbirû bûn.

Di vî şerî de bi dehan kirêgirtiyên rejîma Îranê bûne qurbaniyê siyasetên şaş ên rayedarên vê rejîmê.

Mixabin div î şerê neberamber de şeş pêşmergeyên qehreman û du kes ji xelkê bê berevan ê Kanîreşê şehîd bûn. Li Pîrancixê de jî hêzên rejîmê Ii dema revînê de 17 zehmetkêş û cotkarên Kurd şehîd kirin.

# Bazargernî Bo Hilbijartinê



Riza Fethullanijad

Em nêzî şanoyek din a serkomartiyê li Îranê de dibin, û dîsan jî bazargermî gihîştiye kopika xwe. Heke em serhêla nûçeyên pêwendîdar bi hilbijartina vê carê li malper û rojnameyên aliyên rikeber de bixwînin, bo bîstekê li bîra me diçe ku ew hilbijartin li nav Îranê de û li çarçoveya sîstema Komara Îslamî de birêve diçe, jiber ku bi berçav weha dixûye ku hilbijartineke rasteqîne û li çarçoveya sîstemeke demokrat de heye.

Çend mînakek ji serhêla wan nûçeyên ku li malpeya “xeber online” de bilav bûne weha ne:

Rehîm Meşayî: Silametiya hilbijartinê li stûyê hemiyan e.

Esker Oladî: Pirsa Mûsewî û Kereobî wek şîfreyekê ye ku heke nehê vekirin, emê li hilbijartina pêşiya xwe de di gel kêşeyan berbirû bibin.

Mohemed baqir Qalîbaf: her yekîtiyek bi dûr ji wîlayetê duberekiyeke rût e.

Têgehên wek “silametiya hilbijartinê”, “alîgiriya ji hilbijartinê”, “rapirsî ji xelkê”, “dengê xelkê”, “kandîdatorên hilbijartinê”, û ...hwd, ew qas li serûbendê wan şanogeriyan de têne ducarîkirin, û ew ekter ew qas bi awayek asayî rolê xwe têde dilîzin, ku bi rastî gellek jî cihê heyrîmanê nine, ku hinek ji xelkê bi wan vir û direvan bêne xapandin.


Gellek alî hene ku dijberiya li navbera bandên rejîmê de, dikne hêcetek bona beşdariya di vê şanogeriya bi nav hilbijartinê de. Ew yek di demekê de ku tewaya wan dijberiyan li ser bingeha berjewendiyan wan û parastina pêpkên nîzamê ye û li rastaya qazanc û berjewendiya berev pêşveçûna xebata mafxwazane ya xelkê bi dijî Komara Îslamiya Îranê nine. Belkû ew bazargermî ye, û vê bazargermiyê jî digehînne astekê ku beşek ji xelkê jî bîra wan diçe ku bo beşdariya li vê şanogeriyê de hewce ye ku li detpêkê de bersiva wan pirsyaran bihê dan ku serkomar yan nûnerê parlementoya rejîmê çi deshilatek heye? Çima berjewendiyên çi bandeke nav rejîmê naxwaze ku rexneyan li nebûna pêwendiyan li navbera Îran û Îsraîl û yan jî li navbera Îran û Amerîkayê bigre? Çima çi ektereke vê şanogeriyê rexnê ji vê yekê nebûye û nine e ku komara Îslamiya Îranê wek rejîmeke terorîst hatiye naskirin? Bo çi rexne ji vê nahê girtin ku siyaseta etomiya rejîma Îranê şaş e? Û bi dehan pirsyarên din.




Heke em li radeya beşdariya xelkê li bi nav hilbijartinan li heyamê zêdetir ji sê dehikên borî binêrin, em dibînin ku ji bilî yek carî, bi giştî dakişaneke berçav bi xwe ve dîtiye, ku ew jî nîşaneya vê rastiyê ye ku hejmara vî xelkê ku nakevne jêr bandora rewşa destçêkirî ya bi nav hilbijartinê, rojbiroj zêdetir dibe. Lê dîsan jî mirov nikare bandora vê rewşa destçêkirî li ser rakêşana xelkê bo ser sindoqên rewayîdana bi serkût û serberedayiyê li ber çawan winda bikin.

Komara Îslamiya Îranê ji tev dem û dezgehên xwe, her ji ragehandinên giştî ve bigre heya organên leşkerî û nawendên ayînî, û li her cihî, her ji mînbera mizgevtan heta xwendegeh û cihên giştî, bo bazargermiya bo wan bi nav hilbijartinan mifahê werdigre. Li hember de xelkê mafxwaz ê Îranê li vê pêwendiyê de hewce ye ku li tev derfetan bo nîşandana rastiyan û eşkerekirina vir û direvên rejîmê, mifahê wergire.

## Nerîna Lîderan



Teyib Erdoxan

“Sîstema eyaletan wê pêşketinan bi xwe re bêne. Ev jî nîşana bihêzbûnê ye. Di dema Osmaniyan de jî Eyaleta Lazîstan û Kurdistanê hebû..”



Hesen Memdohî

“her pêşkevtineke zanistî ku derbê li îmana civakê bide, heram e. Ji ber ku wê demê ew pêşkevtina zanistî wê fesadê bilav bike”.



Mehmûd Ehmedînijad

“Balyozên Îranê di cîhanê de balyozên Îmamê zeman in”.



Îsmaîl Bêşikçî

“Têgeha Tirk û îslamtiyê dibe ku destê dewletê rehet bike, lê ti azadî û mafan, bi Kurdan nade qezençkirin”.

www.arsivakurd.org

# Pêşewayê Kurdan canê xwe goriyê netewеya Kurd kir



Ezmûna Komara Kurdistanê bi rêberiya Partiya Demokrat û Pêşewayê Kurdan Qazî Mihemed, yekemîn kiyana Kurdan di şiklê Komariyê de bû ku di rojhelata navîn de kêm wêne bû. Mixabin tenê piştî 11 heyvan zext û gîvaşên welatên xwedî hêz weke Rûsiya, Amerîka, Berîtanyayê ku Îran kiribûn qada rikaberiyên xwe ên siyasî, leşkirî û aborî, û herweha satûsewdayên civaka navnetewî bona parastina berjerwendiyên xwe ên hevbeş, bûne sedema vê yekê ku desthelata Pehlewî û Mosko li ser petrola Bakûrê Îranê li hember piştewanînekirina ji Komarên Kurdistan û Azerbayicanê lihevhatinekê pêk bînin û bi vî awayî artêşa rejîma paşatiyê karî di 26'ê Semaweza sala 1325'ê de davî bi temenê Komarê bîne.

Lê ewa ku cihê hûrbînî û balkişandinê ye, biryara Pêşewa Qazî Mihemd di dema jinavçûna Komara Kurdistanê de ye, jiber ku Qazî Mihemed bi li berçavgirtina nebûna balansa leşkirî di navbera Komara Kurdistan û rejîma Pehlewî de û herweha bi li berçavgirtina herifandina Komara Azerbaycanê û kuştara bêrehmane ya Azeriyan li bajarê Tewrêzê ji aliyekê, û ji aliyê din jî bona bi cih gehandina soz û sondên xwe ên ku di dema ragehandina Komara Kurdistanê de li hember xelkê xwe de dabûn, biryar da ku bona rêgirtin ji rijandina xwîna Kurdan, bi xwe û birayê wî Seyfî Qazî nûnerê xelkê bajarê Mihabadê li Meclisa Milî û herweha kurmamê xwe Mihemed Hisênxan ê Seyfî Qazî wezîrê şer ê Komara Kurdistanê, heya daviya jiyana xwe di nava xelkê xwe de bimînin.

Ev biryara fîdakarane ya dîrokî a Pêşewa Qazî Mihemd bû sedema vê ku rejîma bêbext a Pehlewî di dadgehek fermayişî de, Pêşewa û du hevalên wî bi îdamê mehkûm bike û mixabin di 10'ê Xakelêweya sala 1326'an de, li qada Çarçira ya bajarê Mihabdê û li cihê ragehandina Komara Kurdistanê, hukimê îdamê tê birêvebirin û cardin dîrok ducarî bû û sê xweşmêr û rêberên Kurdan hatin bi darvekirin.

Pêşewa Qazî Mihemed gellek cesûrane canê xwe di pêxema azadiya gel û nîştimana xwe de gorî kir û bi cangorîtiya xwe pêpikên deshilatdariya Pehlewî lerizand û bi vî awayî bû sembola mafxwaziya Krdan û dersa berxwedan û berdewamiya xebatê heya gehiştin bi serbestî û rizgarî ji bindestiyê, di qutabxaneya Demokratê de cihgîr kir. Bi awayekî ku niha jî piştî derbazbûna 66 sal bi ser vê karesata pir ji îxanet de, hêj nav û berxwedaniya Qazî Mihemed stêrka ronîderê rêya xebata her Kurdek welatparêz e û herweha PDK Îranê jî weke partiya Pêşewa û pêşrewê xelkê Kurdistanê nehêlaye ku agirê xebata siyasî û mafxwazaneya gelê Kurd ku bi destên pîroz ên Qazî Mihemed ve hatiye hilkirin, bê temirandin.

Lewra PDK Îranê jî bona rêzgirtin ji şehîdên Kurdistanê bi xasmanî fîdakariya serkarvanê şehîdan Pêşewa Qazî Mihemed, di biryarek dîrokî de, roja 10'ê Xakelêwê weke roja şehîdên Kurdistanê diyarî kiriye û bi vê hincetê her sal bona bicihanîna emegnasî û nûkirina peymana domandina rêya wan a pîroz, rêûresmên curbicur bi rêvedibe û hêvîdare ku rojekê li her çar aliyên Kurdistanê de ev roj weke roja şehîdên Kurdistanê bê diyarîkirin.

A: Arif Velzî





## Ciwanên Çar Perçên Kurdistanê Daxuyaniyek Giring Weşandin

**Bi boneya salvegera darvekirina Pêşewa Qazî Mihemed û hewalên wî û herweha roja şehîdên Kurdistanê, 40 Sazî û Rêxistinên Ciwanên 4 Perçên Kurdistanê peyamek belav kirin.**

**Di peyamê de pêdagirî li ser vê yekê kirin ku her weke di konfransa duyemîn a ciwanê çar perçên Kurdistanê de, mijara roja şehîdên Kurdistanê xistin berbas û têde daxwaz ji tewahiya xelkê Kurdistanê hat kirin ku bona bi fermî nasîna roja 10'ê Xakelêwê weke roja şehîdên Kurdistanê, weke erkê xwe ê netewî hewl bidin.**

www.arsivakurd.org



# Dujminê veşartî

Fatih Salihî




Rêkxirawa Neteweyên Yekbûyî, roja 4'ê Nîsana hemû salekê wek roja cîhaniya xebata dijî mînên erdî, û jêhelbirina zanyariyên giştî ên xelkê li ser tehlûkeyan û rewşa qurbaniyên mînên erdî binav kiriye. Armanc ji diyarîkirina rojek weha nîşandana pêşkevtina li warê hildana mînên bin erdê de, û biyavên tirsnak ên mînên bi cih mayî ye.

Îran yek ji wan welatan e ku her sal, rêjeyek zêde ji xelkên wê dibne qurbaniyê mînên erdî. Bi awayek navincî hemû salê bi taybetî li parêzgehên Kurdî ên Kurdistan, Kirmaşan, Urmiye û Îlamê nêzî 200 kesî têde dibne qurbaniyê wan mînên bin erdê de, û zêdetir ji sê milyon hiktar ji erdên wan parêzgehan bi mînan hatiye dagirtin. Bi awayekê ku li gorî gotina berpirsyarên hikumetî bo hilgirtina mînan li her hiktareke wan ciyan de hewcehî bi sê milyard tûmenî heye, û heke hersal ew kar bigîje encamê, heya 40 salên din hêla bi tewahî mîn nahên rakirin. Helbet heya niha jî serjimêriyek serrast ji mînên erdî, wate vê dujminê veşartî ji aliyê rejîma Komara Îslamiya Îranê ve bi kom û komilkên navdewletî û heta bi bîrûraya giştî a navxwe a welat jî nehatiye ragehandin.

Jiber ku heya niha lêkolîneke hûr û durust li ser qurbaniyên mînê birêve neçûye û ew serjimêriyên li ber dest nikarin durust bin, lewra heke lêkolîneke durus wek vê lêkolînê ku li welatê Nipal de birêve çû, li Îranê de negîje encamê gelek zehmet e ku bê gotin ku ew amarên ku Îran bi awayek ne fermî bilav dike, çiqas rast û durust bin.

Lêkolînên meydanî ku ji hêla rêkxirawên ne hikumî ve birêve çûne, nîşan didin ku nêzî 16 milyon mînên bi cihmayî û jikarnexistî, li herêmên sînorî ên Îranê de hêla mane, ku beşek herî zêde li nav xaka parêzgehên Kurdî de ne, û bi awayê navincî li her rojekê de 2 heta 2.2 kes dibne qurbaniyê mînên bicihmayî ji şerê di navbera Îran û Îraqê.

Hêjayî basê ye ku Komara Îslamiya Îranê heya niha jî konvansyona Otawa îmze nekiriye. Ew Konvansyon rêgiriyê ji endamên xwe dike ku çekên weha berhem bînin ku êş û azarên dirêjheyam bi cih dihêlin, bi taybet mînên dijî takekesî. Ew yek jî tê wateya pêbendnebûna Îranê bi yasayên navneteweyî.

Mixabin karbidestên rejîma Îranê her niha jî piştî 25 salan ku li ser şerê Îran û Îraqê re derbas dibe, hêla bi awayek micid hewil nedane ku herêmên sînorî ji mînên bin erdê de paqij bikin, û gelek caran bi hêcetên curbicur bi dehan qadên nû yên mînan ava kirine, û bixwe jî hokar û sedemê sereke yên qurbanîbûna xelkê wan herêman in, lewra heta dema ku Komara Îslamiya Îranê li ser kar û kiryarên xwe berdewam be, û xerîteya qadêm mînan eşkere neke, û pêngavên hewce bo paqijkirina wan herêma hilnegre, bêguman ew dujminê veşartî wate mîn, wê herroj xelkê herêmê bike qurbanî, û cihên paqijkirî ji qadên mînan nahê xuyakirin.

Li dawiyê de serbarê mehkûmkirina Komara Îslamiya Îranê li warê çandina mînan û hewilnedan bo bê bandorkirina mînan li parêzgehên Kurdî de, û pabendnebûna bi komîsyona Otawa, dibe ew rastiya bihê eşkere kirin ku herçend PDKÎ xwediyê hikumet û dewletê nine, lê bi sedema vê ku partiyeke mirovtewer û mirovdost e, bi awayek ji awayan konvansiyona Otawa wajo kiriye, û pêbend e ku li tu rewşekê de ne mînan berhem bîne, û ne jî ji vê dujminê bi tehlûke mifahê wergire, ku ew jî vedigere ser binema û pirensîpên modern ên PDKÎ, ku berdewam pêbendbûna xwe bi konvansyonên cîhanî bi kar û kiryarên usulî ên xwe selimandiye.

Rojev

## Ew bab mir!



Selîm Zencîrî

Binav hilbijartina gera 11'mîn a serkomariya Îranê qirare du mehên din birêve biçe. Nimayîşek ku gelek medya û nawendên siyasî ên dever û cîhanê çav tê girtine û bi hûrî dişopînin. Li vê navberê de bask û bandên cuda yên rejîmê jî serbarê hin dubendî û nakokiyên selîqeyî, ketine germkirina tendûra binav hilbijartinê û şerê zêringirî ê xwe kirine pêxora medyayan û dixwazin bi vê çendê dîsan raya giştî a Îran û cîhanê bixapînin û hêvîdar bi guhertinan û reformên siyasî bikin. Bi taybetî ku niha rejîma komara Îslamî li asta navxweyî û derekî li xirabtirîn rewşa xwe de ye û rewatiya xwe ji dest daye.

Her ew rêkar û taktîkên ku sê dehsalin di qonaxên cuda de girtine pêşberî xwe û karîne temenê xwe pê dirêj û desthilata şûm a xwe jî berdewam bikin, niha jî di şeklên din de lê bi heman naverok û armancê ve didome. Ya herî girîng ewe ku herdem qelşên selîqeyî ên ji ber deshilat û dizî û talana zêdetir li navbera eniyên rejîmê de kûrttir û berfirehtir bûne, şanogeriyên rejîmê jî berdewam kirine û bandekî xwe ê nermrewtir weke alternatîv dide nîşandan daku refên yekgirtî ên xelkê li dijî xwe têk bide û xwe ji hêrs û kîna pengurî a wan biparêze. Vir de rol û lîstikvaniya bandên cuda yên rejîmê girînge ku êdî ji xelkê Îranê û raya giştî re eşkere bûne û nikarin çi din bi navê reformxwazî û fişqiyatên din xelkê bixapînin û tendûra hilbijartinê gor dilê pîregur û nîzama wî geş û germ bikin.

Ji ber ku her ew binav reformxwaz bûn ku li xirabtirîn rewş û qonaxên jiyana rejîmê de gemiya wê li deryaya tofanî de rizgar kirine û gihandine devbehrê.

Dom R: 9

www.agirikurd.org



Hevpeyvîn:Faxir Molûdî

Îqbal Elîremayî naskirî bi Mam Îqbal kurê Fethulla sala 1338'an li gundê Bêsaran a ser bi bajarê Merîwanê, di malbatek hejar û desteng de hatiye dinê. Her di zarokatiya xwe de jiber feqîrî û destengiyê nikare here xwendingehê.
Mam Îqbal derheq nasyariya xwe bi PDK Îranê re weha dibêje; "Sala 1357'ê rêkxirav û aliyên siyasî derketin holê û di nav bajar û gundên Kurdistanê de çalakî dimeşandin. Wî çaxî çend kesên weke Seyîd Resûl Babî Gewre û Se'îd Efşar li bajarê Mihabadê ve dihatin dewera me û civînên siyasî û civakî ji xelkê deverê re pêk dianîn û basa PDK Îranê û mafê otonomiyê û herweha basê qedexebûna jin bi jinî û bi zorî jin bi şûdan û herweha sitandina mikê xelkê ji Axayan û vegerandina wan bo xwediyên wan dikirin. Ew civînên han bandor xist ser xelkê deverê û bû sedem ku gelek xurtên Kurd bên û tevlî PDK Îranê bin. Ez jî yek ji wan xortan bûm ku di Befranbara sala 1358'ê de bi awayek fermî li bajarê Merîwanê Bûme pêşmerge.
Mam Îqbal derheq roja herî xweş a jiyana xwe dibêje; Dema hêzên PDK Îranê li kimyabarana Helebçê rizgar bûn, Dr. Qasimlo hat pêşiya me û civînek ji kadr û pêşmergan re pêk anî.

Di civînê de min li dor kimyabaran û şerê navbera du dewletên Îranê û Îraqê pirsyar lê kir û di bersiva min de got; "ev kimyabaran karesatek pir dilêş e ku bi ser Kurdan anîne, lewma emê xebata xwe bidomînin û bo demekê ji xwbatê nasekinînin û ez jî weke we hemûyan kolepiştiyê dê avêjim pişta xwe û digel ve dibim", herweha li dor şerê Îran û Îraqê jî got; " Bîr û Hizra me bi tenê li ser çiyayên Kurdistanê ye, jiber ku heya niha çiyayên Kurdistanê li pişta me sekinîne, lewma me xebata xwe bi tu alî û dewleteke ne girêdaye.

Îqbal Elîremayî roja herî nexweş a jiyan xwe weha tîne ziman; "Sala 1368'ê em li baregehên PDK Îranê li Qislanê bûn ku RDK Îranê nûçeya birîndarketina û pişt re şehîdbûna Kak Dr. Qasimlo belav kir. ez pir aciz bûm lê min soz da ku her weke rêberê me yê şehîd Dr. Qasimo di got; Ezê rêya şehîdan bidomînim û heya bêhna min kar dike ez vê rêbazê bernedim".

Îqbal Elîremayî dibêje sala 1372'an min li bajarokê Bazyan a ser bi herêma Kurdistanê keçek peyda kir û min jiyana hevpar pêre pêk anî. Berhema jiyana me jî du zarok in bi navên Tajan û Bêsaran. Ez pir li jin û zarokê xwe hez dikim, bixasmanî hevjîna min, jiber ku di tewahiya zehmetî û nexweşiyên jiyanê li pişta min bûye û xwediyê hizra PDK Îranê ye û berpirsatiya
birêve dibe.

Îqbal Elîremayî derheq kadr û pêşmerge û rewşa niha ya PDK Îranê dibêje; "Berî her tiştî dibe em şanaziyê bikin ku pêşmergê PDK Îranê ne, paşan hewce ye ku kadr û pêşmergên hizbê bi awayek rêkûpêk erkên xwe cîbicî bikin, çûnkî bi kar û çalakiyên zaftir, em dikarin baştir ber bi pêşve herin û ji serkevtinê nêzîk bibin, rewûa ku niha em têde ne, wê bê guhertin û bi vî awayî namîne, lewma dibe em xwe amade bikin bona roja guherînan".

Êqbal Elîremayî di daviyê de dibêje ku; Ez pir şanaziyê bi rojnameya Agirî dikim, jiber ku eva yekemîn car e ku di dema pêşmergatiya xwe de hevpeyvînek bi vî awayî tevî rojnameyek PDK Îranê dikim û deng û hizrên min digijîne xelkê Kurdistanê. Serkevtin û rizgarî bo çar parên Kurdistanê.

Dr.Qasimlo gote me: " Bîr û Hizra me bi tenê li ser çiyayên Kurdistanê ye, jiber ku heya niha çiyayên Kurdistanê li pişta me sekinîne, lewma me xebata xwe bi tu alî û dewletekê ve girê nedaye".




www.arsivakurd.org

## Doma Rojevê

Bi taybetî di sala 1388'an de ku koşka dîktatoriya rejîmê ji hêrs û kerba xelkê ketibû lerzînê û şûşeya e'mrê wê li ber şikestinê bû, bi rûbenda reformxwaziyê sûîstifade ji hesta mafxwazî û azadîxwaziya xelkê kirin û bi kuntirolkirina neraziyan û têkdana refên wan, serbarê tomarkirina xiyanetek din li karnameya xwe de, dîsan rê bo afirandina cinayet û girtinan xweş kirin û carek din emegnasiya xwe bo Weliyê Feqîh û esla nîzamê nîşan dan. Niha jî heman senaryo bi zêdebûna Ehmedînijad dubare bûye û dixwazin tendûra sare hilbijratinê bi lîstikvanên xwe germ bikin ku zehmete vê carê wan re biçe serî û bi qewlê kurdî ew bab mir!


## Nirxa Enflansyonê di sala derbazbûyî de gehist %31.5



Nawenda serhejmariya Îranê nirxa enfilansyonê heya daviya Reşemaya sala 1391'an, %31.5 ragehand.
Di meha Xakelêweyê de nirxa enfilansyonê %26.4 bû, lê di daviya salê wate li heyva Reşemê de gehîşte %31.5 .
Piştî dewleta Haşmî Refsencanî eva yekemîn car e ku nirxa enfilansyonê weha bilind dibe.

# Ka keziyên rewşen, ka biskên dirêj

Eskender Ceiferî



Ger ji dîroka evîniyê binihêrin û bal bidin ser dildariya keç û xortan, ger demek kurt jî bi hevalên çepergeha pîroza evîniyê re bicivin, keziyên rewşen yên berê ên keçên Kurdan tên bîra me. Helbet renge temenê me îzna wê nede, lê me bas ji dîrokê kir, bi alî kêm ve jî dayîk û bavên me û kal û pîrikên me, ji me re basa wê çendê dikin. Eger bêjin gelo kanê ew keziyên rewşen ku ronahiya rojê, jê digirtin û rewşen dibûn û mîna gulistanê şewq dixistin ser çavên xortan, û xort, dikirin evîndarê xwe, renge bêjn gelo ma dema kevneşopiyê maye?! Lê ya rast ew e ku ew, çanda Kurdan e û divê bê parastin. Çandek e ku ji keçan re zaftirîn buha didanê û li hemberî nifşên berê, wan şermezar dike eger wê çandê neparêzin.

Biskên dirêj yên xortan jî, ji hingî şûnde bê buha man ku îdî benûştên devên keçan ketin devên kuran û keçan benûşit qeyîdandin. Gelo biskên dirêj jî kêm balkêş nebûne?! Biskan dilên keçan dişewtand û kezevên dayîkan diheyîrand û gav bi gav dayîk li pey wê çendê dihatin heta ji xortên xwe re keçek a baş berbijêr bikin. Xort jî tev digeriyan û her aliyek jiyanê didanîn ber çavên xwe û tev



keçên gund li pey çavên xwe dilivandin heya her yek ji wan, keça baş û li gor heza xwe peyda bike.

Gelek xuya ye ku di fulkilora Kurdî de, keçan, gringiyeka tayetî heye û buha û nirxeka herî zêde jê re tê danîn. Lê parastina fulkilur û çand, erkek e ku li ser milên keçan e û parastina biksên xortan jî, erkê xortan e.

Lê mixabin nehêlan. Wan "Modêrnîte û Postmodêrnîteyan" nehêlan keziyên rewşen û rojinkerên jiyanê bimînin û nehêlan biskên dirêj û alîkarên jiyanê bimînin. Jiyana kûr û dijwar jî bi jinê ye ku wateya jînê bi xwe ve digire û eger jiyana Kurdî jî, ji boy Kurdan nemîne, renge çanda wan jî bikeve qada çanda Finîqî û Babiliyan ku ketin hindrî kirisdanka dîrokê de û îdî hîç nîşan û hêlek ji hebûna wan nema. Gelo ew keziyên dirêj yên dayîkan ku zarokan, heta şefeqê di xewna xwe de didîtin û dayîkan jî xort û keçên xwe bi wan lorandibûn, ber bi ku de çûn?!

Kanê ew keziyên evîndaran ku jîna wan, dijiyandin û evîn, kûrtir dikirin û dilê xortan dişewitandin?!

Guman tê de tune ye ku pêşdeçûn û zengînbûna rewşa çandî, yek ji encamên herî baş ya pêşdeçûna piroseya dem e, lê nabe dem derbas bibe û çandên ciwanî û bedew, ji nav bibe û wan, kavil bike.

Bila dayîkên Kurdan bizanibin, rojinkirina jiyanê, têhna jînê zêde dike û rewşa jîna Kurdî pêre dimeşe.

Em dinivîsin ji bo dîrokê, bila dîrok bi başî bas ji me bike.

www.arsivakurd.org

# Cudahiyê di navbera du peyamên newrozî de

Şehab Xalidî







Xamineyî rêberê rejîmê di peyama xwe ya îsal ya newrozî de, dîsan cuda ji henek basên mesebî, beşek ji sedema xirapiya rewşa aboriya welat vegerande ser tehrîmên "dujmin", û "dujmin" wek sebebkarê vê rewşa pirr karesatbar ya aborî da zanîn, lê bas ji sedema dasepandina wan tehrîman ji aiyê rojavayiyan ve nekir, herçend ku xelkê welatê me êdî dizanin ku sedema sepandina wan tehrîman jî serhişkiya karbidestên rejîmê û siyasetên wan yên tevdanîkarane ne.

Ji aliyek din ve navbirî dibêje ku li "koma nîzam" û "koma xelk"ê me, di sala borî de, ber bi pêşve hereket kirine. Bê guman ew jî rast e. Hereketa nîzamê di warê îdamkirina hemwelatiyan û kuştina kolberên Kurd ber bi pêşve bûye, û xelkê me jî di warê rewşa pirr karesatbar ya giranî, bêkarî û hejariyê, hereket baş û ber bi pêşve hebûne!!.

Herweha li peyamên pêşîn ên Xamineyî de navbirî zêdetir rewşa aborî û siyasî ya welat şirove dikir, lê evsal navbirî zêdetir pêşbîniya sala 1392'an wek salekê kiriye ku bi hemaseya siyasî û hemaseya aborî, û berdewam kirina pirojeyên aborî ên sala borî, barê giraniyê li ser milê xelkê, dê rabe û bêhnek rehet wê vedin, ku diyarîkirina vê destewajeyê di ciyê destewajeyên mesebî de, nîşana tirsa wan ji astê nerizayetiya xelkê welat di warê aborî de ye, ku jiyan ji xelkê welat reş kirine.

Lê Ehmedînijad berevajiyê Xamineyî, pirsa giring li cem wî, pirsa hilbijartinê bûye, û navbirî ragehandiye ku biryarderên dawiyê di hilbijartina serkomariyê de xelk in. Ew peyama wî jî ji aliyekê ve dikare nîşaneya geşekirina bê qas ya şerê deshilatê di navbera bandên curbicur ên rejîmê, û hewildana girûpên dijbere Ehmedînijad bona derxistina deshilata serkomariyê ji destê hevalbendiya Ehmedînijad ya bi qewlê dijberên Ehmedînijad "girûpa Înhirafî" de be.

Bê guman ew hilbijartin hem di warê şerê di navbera bandên rejîmê de, û hem jî di warê tirsa rejîmê ji serhildana nerizayetiyan ku dikare rejîmê hisabî bêxe tengaviyê de giringiya xwe heye. Lê xala herî balkêş ya di vê peyama Ehmedînijad de pêdagirî kirin li ser dengê xelkê ye ku eva jî îdiayek taze nine, û tewaya xelkê welat vê rastiyê bi taybet piştî hilbijartina sala 1388'an baş dizanin ku dengê xelkê çiqas bo karbidestên nîzamê giring e, û Ehmedînijad çiqas bawerî bi dengê xelkê hebûye û heye.

Pêdagirîkirina navbirî li ser cihgirkirina dadperweriya cîhanî di vê peyamê de nîşan dide ku wî di wan çend salên serkomariya xwe de dadperweriyek li Îranê de cihgir kiriye ku êdî xelkî welatê me, wê bo heta heta berê vê dara dadperweriya Ehmedînijad bixon, lewra niha welatên din ên cîhanê jî hewcehî bi dadperweriya Ehmedînijad hene!!

Basnekirina bi hûrî li ser rewşa aborî jî, ji aliyê Ehmedînijad ve dikare weha bê şirovekirin ku ew deshilatê bi hemû band û girûp û aliyên xwe ve di kirîza aborî de berpirsyar dizane, ne tenê kabîneya xwe, lewra jî xwe li vê basa giring nedaye.

Bêguman xelkê welatê me êdî bi wan peyaman ne tenê dilxweş nabin, belkû ew peyam, bo wan tê wateya destpêkirina salek nû ji giranî, gendelî, îtiyad û hejarî û gellek belayên din. Lewra êdî bi hêviya nemana vê deshilatê kar û xebata xwe di sala nû de dest pê dikin, ne bi hêviya peyamên Xamineyî û Ehmedînijad, jiber ku bexteweriya wan tenê û tenê di nemana vê deshilatê û cihgirbûna deshilatek demokratîk û xelkî de ye.

# Gotinên Pêşînan

A: Çiya Mazî



**Dolab hebs e tejî reqs e neqs hews e:**

Dolab alavên, libasên ku mirov têde hiltîne, teşî tim dirêse û dilîze, neqş jî ku mirov bi hewes (kêfxweş) be çê dibe.

**Dost li pêşiya mû dipeyive û dijmin li paş mû dipeyive:**

Wekî dost ji dijmin jî ku bi mirov re dipeyive pir zirav dide ber mirov. Lêbelê sînorek heye, heke mirov zanibe wî sînorê zirav mirov dê zanibe ku kî dost e kî dijmin e.

**Dostê bêaqil barê piştê ye:**

Dostê mirov heke bêaqil be ji mirov re dibe asteng û bar. Ji ber dostaniyê jî divê mirov alîkariyê jî bike. Dema serê dostê mirov î bêaqil di teşqeleyê keve mirov jî alîkariyê pê dike û serê mirov jî pê re dikeve teşqeleyan.

**Dostê bava nabin dijminê lawa:**

Ev gotin jî gotinek feodalî ye wekî gelek gotinên pêşiyan di dema feodalî de hatiye gotin. Lewre îro rewş cûda ye, dijminê bavan dibin dostên lawan û dostên bavan jî dibe ku bibin dijminê lawan.
w


**Dostê min dijminê postê min :**

Dost carinan bi xayînî benda mirov dikevin û tirba mirov dikolin, li dijminê wiha divê miqatebe, dijminê ku dost xuya dibe.

# ŞARISTANA KIRMAŞAN

Di pirtûkên kevnar de ku bi zimanê Kurdî hatine nivîsandin, navê bajar bi May û hin caran bi Mad hatiye nivîsandin. Gelek ji lêkoler û dîrok zanan dibêjin û nivîsandine ku navê Kirmaşanê di esil de Kurmancan bûye ku ji peyva Kirmanc yan Kurmanc hatiye wergirtin





A:Mecîd Rajanî

Şaristana Kirmaşanê bi panahiya 8547 hezar kîlometiran wek nawenda parêzgeha Kirmaşanê xwediyê girîngiyek taybetî û sitratêjîke.
Şaristan ji 4 herêman û 13 navçeyan pêk tê û xwediyê 825 gundan e, û nifûsa wê pitir ji 990.368 hezar kesane.

Kirmaşan wek mzintirîn bajarê Kurdan ê cîhanê tê mêze kirin ku xwediyê gelek taybetmendiyên baş û balkêşe.


Bajarê Kirmaşanê li dîrokê de wek deriyê hatin çûna Qara Asiyayê bo mezopotamiyê tê mêze kirin. Av û seqaya bedev û hebûna çiyayên bilin û serkeş wek Şaho û Bêstûn û Çiyayê Sipî û derbas bûna çemên wek: Raz awer,Qeresû, Gamasiyab, Setmere û Kerxe wek dayikekê Kirmaşan û xaka vê li hembêz girtine.

Seba vê av û seqaya bedev a Kirmaşanê 273 hezar hektar zeviyên çandiniyê hene ku ji vê hindê 58 hezar hektar avî û yên din dêymî ne.
Kirmaşan wek nawenda Rojavayê Îranê jî tê mêze kirin û di nava gelên din de wek bajarê dayika Kurdistanê tê binav kirin.
Kurdên herêmê hemû bi zaravê Kelhûrî,Lekî,Soranî,Lorî dipeyvin û praniya wan Şîe ne, lê di herêmê de gelek Kurdên Yarsan jî hene ku ev ne musilmanin.

Nave Kirmaşanê ji devrana Sasaniyan li ser wî bajarî hatiye danîn. Li devrana Îslamî de navê bajar bo "Qere Mîsin" hatiye bedel kirin. Di pirtûkên kevnar de ku bi zimanê Kurdî hatine nivîsandin, navê bajar bi May û hin caran bi Mad hatiye nivîsandin. Gelek ji lêkoler û dîrok zanan dibêjin û nivîsandine ku navê Kirmaşanê di esil de Kurmancan bûye ku ji peyva Kirmanc yan Kurmanc hatiye wergirtin.

Di destpêka serhildana gelên Îranê a sala 1357'an, navê bajar bi fermana melayan bo Baxteran hate guherîn,lê li encama berxwedana xelkê û nerazîbûna gel rejîmê paşekêşe kir û her bi navê Kirmaşanê razî bû.

Kurdên Kirmaşanê gelek xwedî hest û Kurdperwer in û di pêxema gelê xwe de gelek nirxên mezin dane. Di bajêr de gelek çapemenî hene lê piraniya wan siyasetên dewleta Îranê a li dijî Kurdan û înkara nasnameya Kurdiniyê birêve dibin. Ev rojname û çapemeniyên ku karê çandî û wêjeyî dikin hemû ji aliyê dewletê ve tên daxistin.






# AGIRÎ

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Tel: (+)9647503640792

## Birêz Mistefa Hicrî Rêz Ji Keda Şehîdên Kurdistanê Girt



Birêz Mistefa Hicrî û hevjîna şehîd Xale Şêx Mihemed Bilbasî di dema vekirina hola wêneyên şehîdan de




## Jiyana rojnamevaniya şehîd şerefkendî bû pirtûk




Xwendekarekî kurd lêkolîn li ser jiyana rojnamevaniya şehîd Dr. Şerefkendîkiriye û ew lêkolîn wê bibe pirtûk.

Hemîd moxtarî ew pirtûk ji 6 beş û 117 rûpelan de amade kiriye û bo vê lêkolînê ji 50 çavkaniyan û çendîn gotûbêjan mifah wergirtiye.

Navbirî niha li zanîngeha selahedîn li beşa Ragehandinê de ,xwendina xwe didomîne û dixwaze vê lêkolînê bike têza xwe ya masteriyê.


Her di vê derheqê de malpera Kurdistanmedia.com ku malpera fermî ya PDKÎ ye, bi navbirî re hevpeyvînek pêk aniye ku xwendevanên hêja dikarin serdana wê malperê bikin, û gotûbêja navbirî li vê derheqê de bixwînin.

em wek rojnameya Agirî destxweşiyê ji birêz Hemîd Moxtarî dikin û hêviya serkevtinê li kar û xebata wî de dixwazin, û hêvî dikin ku li demek nêz de ew pirtûka navbirî bê çap û bilavkirin.

## Şikispiyêr di gellek waran de yekemîn bûye

Lêkolînan eşkere kiriye ku Şikispiyêr serbarê vê ku nimayişnamenûsek bihêz bûye, bazirgan û malikek (xwedî mal û milkek) zîrek û qazancxwaz bûye.

Encama lêkolînê vê yekê eşkere dikin ku Şikispiyêr bona qazancê xwe mifah ji “xelay”ê ya Birîtanyayê wergirtiye, bi awayekî ku gellek caran bona hilgirtina xwarinê û firotina çendhember ya wan xwarinan, ji aliyê hikumetê ve biryara destbiserkirina wî hatiye derkirin.



www.arsivakurd.org